
elephantastisch! **Hamm:**

# Amadeyîji bo Dibistanê

Dayik û bav



Dibistan Baxçê zarokan

## Agahdarî
## ji bo dayik û bavên
## zarokên çar salî

kurdisch

# Pêşgotin

Dayik û bavên ezîz

Zaroka we wê piştî du salan derbasî dibistanê bibe. Em dixwazin di rêya vê belavokê de we pêşwext derbarê derfetên alîkariyê yên curbecur ji bo amadekirina sebaret destpêkirina dibistanê agahdar bikin.

Hunê di vê belavokê de şîret û pêşniyarên çawahiya tevgeriyê ji bo derfetên piştgiriyê di qûnaxa bingehîn û seratayî de derbarê van mijarên xwarê de peyda bikin:

- Liv
- Xwendina bîrkarî
- Mediya
- Xwendina civakî û pirçandî
- Laş tenduristî û xwarin
- Xwendina mûzîkî û ciwaniyê
- Ziman û danûstandin
- Xwendina zanistî û teknîkî

Em hêvî dikin, ku em karibin bi vê yekê naskirineke destpêkeyî derbarê çalakiyên piştevanî û alîkariyê yên heyîn bidin we û em demeke xweşji we re ji bo cerbandina van çalakiyan bi zarokên we re dixwazin.

Karin Diebäcker
Rêvebiriya xwendina dibistanî

Susanne Wessels
Rêvebiriya dibistanê ji bo bajarê Hammê

# Liv

**Materiyal, xetên înternêt û cih wek derfetên alîkariyê**

- Seyranan ji bo yarîgehan, cihê avjeniyê, parkan û daristanê çêkin û wan çalakiyan bi liv saz bikin. Kesê ku karibe ber û paşve bi rê de here, wê ji wî re jimartina ber û paşve jî hêsantir be. Kesê ku tiştên xwehir li ser alavên hilkişîna jor dîtibin û bi wan lîstibe, wê hêsantir karibe tîpa A binivîse. Kesê ku carekê xwe ji cihê hilkişandina ber bi jor ve çip kiribe, wê karibe hêsantir peyvên manayî mîna rakêşî fahm bike.
- Materiyalên curbecur deyne ber dest (sindoqan, kartonan, betaniyan, doşekan, maseyan, kursiyan, pehlîvan …)
- Sêçerxok, Roler, çerxa birêdeçûnê, biskilêt: Bila bicerbînin û wisa fêrî ajotinê bibin
- Jêhatbûna liva hûr di jiyana rojana e bicerbînin (li xwe û ji xwe kirina cilan, xwarina bi kêr û çetel, birîna bi meqesê, rakêşana morikan di ta de, dirûtna morikên hûtîkirinê, strandin, bikaranîna darikên raxandina cilan.
- Rêyek bi livandin ya dibistan û baxçê zarokan : Livandin li ber sibê şanên mejî hişyar dike û şiyana terkîzê xurtir dike, û her wekî din jî çûnûhatina bi lingan ya berdewam li ser rêyên çûnûhatinê metirsiya bûyerên trafîkê ji zaroka te re kêmtir dike.

**Hun dikarin agahdariyên berferehtir li ser vê malperê peyda bikin:**

- www.movere.de (Movere, Komela ji bo piştgiriya geşpêdana derûnî û livandinî)
- www.ssb-hamm.de<br>(Stadtsportbund Hamm,<br>Kurteyek derbarê çalakiyên werzişî li bajarê Hammê)
- www.aok.de<br>(Yekşemên werizşvanan yên AOK li nîvsala zivistanî li ba komelên werizşî yên mezin li Hammê)
- Komelên werzişî yên herêmî li taxên bajêr

# Xwendina bîrkarî

**Materiyal, xetên înternêt û cih wek derfetên alîkariyê**

- **Bîrkarî li dema danhevê** (wek mînak materiyalan wek pênûsan li gorî rengên wan û şêweyên wan û mezinahiya wan rast bikin)
- **Bîrkarî li dema rastkirina masê** (Kesên amade bijimêrin û li gorane wan sênîk û kevçî û kêr û çetelan deynin ser masê)
- **Bîrkarî li dema birêdeçûna li ser derecan** (Li dema çûna jor yan daketina jêr pêpelûkên derecê bijmêrin û navê jimarê bêjin)
- **Nimûne û yasayetiyên di siruştê de peyda bikin** (wek mînak hevrêziya hasinên tirênê, zincîra morikan li gorî yasayetiyê bi ta ve bikin, wêneyên hevrêz bi rengên avî çêkin)
- **Bîrkarî li dema kişandina giraniyê, pîvanê û danberhevkirinê** (wek mînak dirêjbûna bejna zaroka deynin ber hev, li dikanê bi terazwê bipîvin, demjimêra xîzî li dema şûştina didanan

**Hun dikarin agahdariyên berferehtir li ser vê malperê peyda bikin:**

- **Mala lêkolînerên piçûk:**
  https://www.haus-der-kleinen-forscher.de/de/praxisanregungen/experimente-themen/mathematik/
- **PIK AS ya TU Dortmund:**
  https://pikas.dzlm.de/material-pik/mathematische-bildung/haus-2-informations-material/literaturtipps

# Mediya

**Materiyal, xetên înternêt û cih wek derfetên alîkariyê**

- Hemî şêweyên mediya ji bo karê perwerdeyî di warê mediya de deynin ber dest, û herweha cîhaz ü alavên kevin wek makînên nivîsandinê, wênekêşên kevin, alavên tomarkirinê, tomara kasêtan û her wekî din.
- Derfetên karê destan li ser mijara sînemayê, sînemeyên tiliyên mezin xwe bi xwe çêkin
- Wêneyên zarokan, yên saziyê, yên malbatan, li ser kar bikin û pêşkêş bîneran bikin
- Derfetên wênekêşiya dîcîtal (Wênegirtinê, guhertinê, kolajê û her wekî din) bikar bînin
- Ode û joreyan bi kolajên medyayî bixemlînin
- „Geriyana li dûv nepeniyên teknîkê“: geştekê di nav cîhaz û alavên kevin de wek kompyuter/telefûnê li dar xînin

**Hun dikarin agahdariyên berferehtir li ser vê malperê peyda bikin:**

- Ewlekarî bi rêya jêhatbûna di warê medyayî de:
  http://www.klicksafe.de/Eltern
- Rê li ber pevçûnan bigirin:
  http://www.mediennutzungsvertrag.de
- Pasa medyayî ya NRW:
  https://www.medienpass.nrw.de/de/inhalt/eltern-und-medien-0
- Malpera ji bo zarokan, dayik û bavan û perwerdekaran:
  https://www.internet-abc.de/Eltern

# Xwendina civakî û (pir-) çandî

**Materiyal, xetên înternêt û cih wek derfetên alîkariyê**

- Çavên xwe li ber hestan vekin û bi zarokan re li ser wan biaxivin (Karta hestan)
- Pirtûka li ser mijara danûstandina bi zarokan re bixwînin (Mîrza Fridolin her tişt jê re serbest e, Her tişt ji min re ye …)
- Derfetê ji bo lîstina rolan bi bûkên destan çêkin, bûksemaker, şanoya bûksemaker….
- Erkan bidin ber zarokan, taku behweriya wan bi wan bi hêz bibe (masê rast bikin, alîkariyê bikin li dema çêkirina xwarinê…)
- Li zarokan başguhdarî bikin û bi wan re li ser serpêhatiyên wan biaxivn
- Çalakiyên hevbeş(leystok, seyran…)
- Vekirî bin ji bo çandin curbecur
- Rêbaz û sînoran deynin

**Ev kes û cih dikarin bi dilxweşî agahdariyan li ser van mijaran bidin we:**

- şêwirdariya dayik û bavan / şêwirdariya perwerdekirinê
- Dibistana dayik û bavan li Hammê
- Navenda herêmî ya bajarê Hammê ji bo întegrasiyonê
- Pirtûkxaneya bajêr û pirtûkxaneyên taxan

# Laş, tenduristî û xwarin

**Materiyal, xetên înternêt û cih wek derfetên alîkariyê**

- Pêl heriyê kirin, vestrandin bi materiyalên curbecur (wek mînak xîzê, macûnê, şirazê, axê)
- Leystokên tamkirinê, destlêdanê û bîhnkirinê
- Serdana bazarê, nanxaneyê, çandingehê, cihê şîrdotin, karsaza avê
- Dîtin yan rasthatina li tişt, cil û bergên kar û pîşe û çandên curbecur
- Piştgiriya serxwebûnê (wek mîna li xwe û ji xwekirina cilan, bi tenê çûna destavê)
- Çêkirina xwarinan bi hev re
- Bi gelek rêyan de bi lingan yan bi biskilêtan herin

**Hun dikarin agahdariyên berferehtir li ser vê malperê peyda bikin:**

- Forschungsdepartment Kinderernährung: https://www.klinikum-bochum.de/fachbereiche/kinder-und-jugendmedizin/forschungsdepartment-kinderernaehrung.html
- Mala lêkolînerên piçûk –
  Projeya laş https://www.haus-der-kleinen-forscher.de/de/praxisanregungen/experimente-themen/koerper/
- www.kindergesundheit-info.de

# Xwendina muzîkî û ciwaniyê

**Materiyal, xetên înternêt û cih wek derfetên alîkariyê**

- Zengîniya bi materyalan ya her dem vekirî û li ber dest:
  Kaxet - mezinahî, şêwe û xasiyetên curbecur
  Reng - avî û hişk, pênûsên neqşkişandinê yên curbecur
  Avê, heriyê, macûnê, daran, şirazên bikêrhatî, xîzê, hiriyê, caw, morikan, meqesan, kartonên bi mezinahiyên curbecur deynin ber destan
- Tiştên dengdar li hundir û li derve (têderxistina dengan, gong, zengilan, darê baranê) bikar bînin
- Alavên mûzîkê yên curbecur (Ji leystoka zengilan bigire heta bighîje piano û her wekî din) û her weha alavên ji çandinên din nas bikin
- Li şêwazên mûzîkê yên curbecur guhdarî bikin
  (Stranên zarokan, perçên klasîk, „Dîsko“, mûzîka dîlanê, mûzîka ji Welatên din)
- Destmalan, terîşkan, tiştên xwe guherînê, mîkrofonê ji bo lîstinê deynin ber destan

**Hun dikarin agahdariyên berferehtir li ser vê malperê peyda bikin:**

- www.hamm.de/kultur/kulturangebot.html
- www.hamm.de/stadtbuecherei.html
- www.hamm.de/musikschule.html
- www.helios-theater.de

# Ziman û danûstandin

**Derfet ji zarokan re tê dayîn,**

- Ku xwe bi rêya şêweyê guherîna serûçav, liva destan û liva laşê xwe derbirînin
- Ku xwe di çarçoveya guftûgoyan de derbirînin û li ser hestên xwe, dîtina xwe, bîr û hizra xwe û serpêhatiyên xwe û her wekî din biaxivin,
- Ku fêrî rêbazên axaftinê di kiriyarên rojane de û di hevkişandinê de bibin û bikar bînin,
- Ku zengîniya peyvên xwe zêde bikin û peyvên nû (peyvên pisporî jî) bikar bînin,
- Di **zimanê xwe yê zikmakî de** bi hev re bidin û bistînin û piştgiriyê di vî warî de werbigirin,
- Ku giringiyê bidin xwendina pirtûkan û dilxweşiyê ji bo çêkirina çîrokan û gotina çîrokan li ba wan geş bibe û taku bi vê yekê dergehek ji bo nivîsandinê, wek alavekî ragehandinê û danûstandinê, ji wan re vebe

# Xwendina zanistî û teknîkî

***„Seyr mayîn destpêka hemî zanistan e“***

*Arîstotêlês*

**Materiyal, xetên înternêt û cih wek derfetên alîkariyê**

- **Seyrkirina siruştê** (Rabûna tavan, rojhilat, demsalên ronahî û tarî, li ajalên piçûk li ser mêrgê temaşe bikin)
- **Nanpatin û aşpatin** (Tevlîhevkirin, germkirin, guherîna madeyan)
- **Serdana cihê vegerandina gemarê, quba felekê, karsaziya avê, alavê zelalkirina avê**
- **Avakirin û duristkirina bi materiyalên curbecur**
- **Materyial** (cîhazên teknîkî yên kevin, qedeh, Dûrbîn, sindoqên avakirinê, çoleçira, neynik, alavên tamîrê)

**Hun dikarin agahdariyên berferehtir li ser vê malperê peyda bikin:**

- Mala lêkolînerên piçûk –
  Projeya teknîkê: https://www.haus-der-kleinen-forscher.de/de/praxisanregungen/experimente-themen/technik/
- http://experimente-fuer-kinder.blogspot.de
- https://www.geo.de/geolino/basteln/15225-thma-experimente
- https://www.kids-and-science.de/experimente-fuer-kinder

Hamm:

elephantastisch!



Desteya sernivîskaran
Weşanger
Bajarê Hammê
Serokê şehirdariyê
Rêvebiriya xwendina dibistanî
Wêne: Fotolia/Christian Schwier;
Fotofreundin; Woodapple,
auremar
Tîraj 200 dane
Dema derketinê 08/2020

Karmenda berpirsiyar li
Rêvebiriya xwendina dibistanî
Xanim Klöcker
Tel.: 02381/17-5020
E-Mail: kloeckerm@stadt.hamm.de